Jîn

Hindek cara ez pisîar dikim milletêt Rojhelata Navîn ji kîve hatîne. Belkî hindek ji wana ji binemala pêẍember Îbrahîmî. Jina wî ya ewilî Sare Xwidê Îsẖaq daê, u Îsẖaq babkalkê Cihîa u Edûmîa ye. Jina wî ya dûê Hacer Xwidê Îsma'îl daê u ew jî babkalkê 'Ereba ye. Piştî Sare mir, Îbrahîmî jinek dî îna, navê wê Qetûre bî u Xwidê şeş kurr danê. U navêt wan Zîmran u Yeqşan u Midan u Mîdîan u Yeşbaq u Şuẖa. Belkî ji van kurra babkalkêt Kurda u Farisa u Afẍanîa u Kaldana u Sirîana u milletêt dî li Rojhelata Navîn.

Ji ber hindê, heker ẖemî milletêt Rojhelata Navîn bira u pismamêt êk u dû ne, u heker ew ẖemî ji êk mal hatîne, buçî kerrbê wan gelek ji êk u dû çit? Buçî bu hizaran sala êk u dû dikujin?

Demekê di mêjua Kurda da bu nimûne salêt 90 Kurda şerrî êk u dû kir u gelek kes hatina kuştin. Buçî? Kurd êk millet in u ẖemî birayêt êk u dû ne. Pêtivî ye ẖemî ẖeş êk u dû bikin u rêzê li êk u dû bigirin. Her wesa digel kesê bîanî da, çunku heker her miruvek ẖeş Xwidê bikit, dê rêzê li xu girit, her wesa dê ẖeş heval u cîran u kes u karêt xu kit.

Reha kerrb u kînê u kuştinê serhildan beramber Xwidê ye.

Ma ez pişteyanê birayê xu me?

Wextê Adem pêẍember li Beheşta 'Eden bî, Xwidê ferman li wî kir, "Ji ẖemî darêt li behştê bixu, belê hişîar be ji dara zanîna baş u xirabîê ne xu çunku heker te xwar bê guman tu dê mirî." Belê piştî hîngê her dû Ademî u jina wî fêqîê ji dara zanîna baş u xirabîê xwar, leşêt wan dest pê kirin piç piç mirin u gîanêt wan jî mirin – ji ber gunnehêt wan hevalbendîa wan digel Xwidê hate birrînê. Belê Xwidê li wan burand, bes ji ber gunnehêt wan Xwidê gîanewerek bê gunneh kuşt u cilik ji çerimî bu Ademî u H̱ewaê çêkirin u kirine ber wan. Îna ji ber gunnehêt wan, Xwidê ji beheşta 'Edenê derêxistin daku ew fêqîê dara jîanê ne xwin u bijîn her u her bi leşê mirî.

Adem u H̱ewa dû kurr hebîn, navêt wan Qabîl u Habîl bîn. Kerrbê Qabîlî ji birayê wî vedibî. Ku Qabîl kesê êkê bî li ser 'erdî êkê bikujit u birayê xu Habîl kuşt ji ber serhildanê wî beramberî Xwidê. Eve he çîroka wî ye.

Qabîl cutîar bî u Habîl şivanê pezî bî. Zanîn pêtivî ye qurbanekê bu Xwidê bidin. Qabîlî berhemek ji berhemê 'erdî pêşkêşî Xwidê kir, belê Habîlî ji baştirîn u qelewtirîn nexirîêt pezê xu pêşkêşî Xwidê kir. U Xwidê gurîê Habîlî qebîl kir u jê razî bî, belê gurîê Qabîlî qebîl ne kir u jê razî ne bî (çunku bê xwîn bî).

Îna Qabîl gelek kîn girtî bî u navçavêt wî têk çûn u gelek turre bî.

Xwidê pisîar ji Qabîlî kir, "Tu buçî kîn girtî bî ji ber Habîlî? Buçî navçavêt te têk çûn? Heker te kirîara baş kir ba, erê navçavêt te ji keyfa geş ne dibî? U heker tu kirîarêt baş ne kî, gunnehek ya li def dergehî li hîvîa te ye, u di dana di çirrsînît u gelek divêt desthelatîê li ser te bikit. Belê divêt tu desthelatîê li ser bikî."

Qabîl guhê xu peyvêt Xwidê ne bî u piştî hîngê hêrş kire birayê xu Habîlî u kuşt.



U Xudanî pisîar ji Qabîlî kir, "Kanê birayê te Habîl?"

Ewî bersiv da, "Ez nizanim. Ma ez pişteyanê birayê xu me?"

Îna Xwidê gutê, "Te çi kirî ye? Dengê xwîna birayê te ji 'erdî hewar dikit min." U Xwidê nifrîn li Qabîlê kir u wesa Qabîl ji def Xwidê derket.

****

"We yê guh lê bî, ku ya gutî ye xelkî berê: kuştinê ne kin u her kesê kuştinê bikit pêdivî sizakirnê ye. Belê ez dibêjime we, her kesê ji birayê xu turre bit, pêdivî sizakirnê ye u her kesê bêjite birayê xu "Ey Nezan" yê pêdivî ye li ber civata bilind bête dadgehkirin u her kesê bêjit "Ey êvel î!" pêdivî agirê duzexê ye.

Vêca heke te li gurîgehê [cihê qurbanê] xelatê xu pêşkêşkir u li wêrê hate bîra te, ku birayê te tiştekê li ser te heye, xelatê xu li ber gurîgehê bihêle u here birayê xu aştî bike u paşî were xelatê xu pêşkêş bike.

Lezê bike hêşta hîn di rêka dadgehê da digel hevdijê xu pêk were, heke ne dê ew te dite destê dadwerî, dadwer jî dê te dite destê zêrevanî u dê te havêne di zîndanê da. Bi rastî ez dibêjime te, ku tu ji wêrê dernakevî heta tu filsê dîmahîê jî ne dî."

- axiftina 'Îsayê Mesîẖ (Mizgînî ya Mettî 5:21-26)

"Jîn" guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com

© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.